NSW GOVERNMENT

## What do I need to know if I want to appeal a suspension or expulsion?

Parent/carer information

# Divê ez çi bizanibim eger ez dixwazim îtiraza derxistinê bikim?

## Kaxeza rastiyê ya dêûbav/lênerînvan

### Îtirazkirin çî ye?

Îtirazkirin dema ku hûn daxwaz dikin ku biryarek careke din were dîtin. Ev jî ji ber ku hûn bi biryara ku hatî girtin ne razî ne.

### Ez ê çawa rawestandin yan derkirinê îtiraz bikim?

Heger hûn bawer dikin ku midûr biryarek ne adilane an jî siyasetên rast neşopandiye, hun dikarin îtiraza biryara seknanadinê an jî derkirinê bikin. Xwendevan, dê û bav û çavdêr dikarin forma îtirazê dagirin.

Îtîraz dikarin li Ofîsa Perwerdehiyê ya herêmî were kirin. Ofîsa Perwerdehiyê ya herêmî dikare ji we re bibe alîkar ku hûn pêvajoyê fêm bikin. Ew jî dikarin ji we re bibin alîkar ku hûn daxwaz nameyê binivîsin. Xwendgeha zarokê we dikare agahdariya têkiliyê ji bo Ofîsa Perwerdehiya we ya herêmî peyda bike.

Biryarek derbarê îtîrazê de ji hêla Rêvebir, Serkirdayetiya Perwerdehiyê yan Rêvebirek, Performansa Xwendegehê ve were dayîn û dê di navbera 15 û 20 rojên xwendegehê de were girtin. Dema ku îtîraz hat kirin û biryar hat dayîn dê têkilîyê bi we re daynin. Eger pêdiviya we bi agahiyên zêdetir hebin, hûn dikarin bi Daîreya Perwerdehiyê ya herêmî ya ku îtîraz lê hatiye kirin re têkilî daynin.

### Encama îtiraza rawestandinê

Ger îtiraza li ser rawestandinê were pejirandin, û biryarder bi daxwaza we razî be, mûdîr dê bi we re têkilî daynin da ku piştrast bikin ku zarokê we vegere xwendegehê di zûtirîn dem de. Biryara îtirazê dê li ser qeydên zarokê we were tomar kirin û sekinandin dê ji qeyda zarokê we were rakirin.

Ger îtiraza li ser rawestandinê neyê piştgirî kirin, û biryarder bi daxwaza we razî nebe, zarokê we dê heya roja ku lihevkirî li ser rawestandinê bimîne.

### Encama ji îtiraza derkirinê

Ger îtîraza derbarê derkirinê de were piştgirî kirin, û biryarder bi daxwaza we razî be, dê mudûr bi we re kar bike da ku pirsgirêkên ewlehiyê yên cidî çareser bike û tedbîrên piştgiriyê bide da ku zarokê we vegere xwendegehê. Biryara îtirazê dê di qeydên zarokê we de were nivîsandin û derxistin dê were rakirin ji qeydê zarokê we.

Ger îtiraza derkirinê neyê piştgirî kirin, û biryarder bi daxwaza we razî nebe, dibe ku gelek vebijarkên din li ber destê zarokê we hebin. Ger ev çêbibe midûr dê bi we re kar bike ji bo eyarên alternatîf ên li gor hewcedarîyên zarokê we, sererast bike.

Ger îtiraza derkirinê neyê piştgirî kirin û zarokê we 17 salî û mezintir be, divê hûn û zarokê xwe li vebijarkan bigerin ku fêrbûnê bidomînin an veguhezîn ser kar.

### Ez dikarim çi agahîyan ji dibistanê bigirim?

Hun dikarin agahîyên zêdetir ji dibistanê bixwazin bê ka çi bûye û çima. Divê dibistan ji we re şîrove bike bê ka sedemên biyarên wan çi ne, çi çalakî dê bên kirin û çî bikin eger pirsgirêkeke we hebe.

### Ez dê çawa gilî bikim?

Agahiyên li ser parêzvaniya ji bo zarokê weji bo dêûbavan hene. Agahdariya li ser şikat krin ê jî heye, ger hîn jî fikarên we li ser pêvajoya îtiraza rawestandin an derxistinê hebin.

Agahiyên li ser danûstendina bi xwendegehan re di Peymana Civaka Xwendegehê de tême pêşkêş kirin.

### Xizmeta wergerandina telefonî

Heke hûn dixwazin bi xwendegehê re têkiliyê daynin û ji bo Îngilîzî hewcedariya we bi alîkariyê heye, ji kerema xwe telefone xizmeta wergêriyê 131 450 bikin, ji wan re bêjin hûn çi zimanî diaxafin û ji operator bixwazin ku telefone xwendegehê bike. Operator dê wergêr li ser xetê peyda bike da ku alîkariya we bike. Ev xizmet bê pereye.